ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

XWELÎXAN

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran...

Hebû tunebû, dibêjin rojekê li welatekî dûr, zilamek cara duyemîn zewicî. Lê jina wî ya nû wisa qure û pozbilind bû ku ji vî aliyî ve, li dinyayê yeke wek wê tunebû. Du keçên vê jinikê jî hebûn. Ev herdu jî ji her aliyî ve, bi taybetî jî ji aliyê pozbilindiyê ve pir dişibiyan diya xwe. Zilam jî, ji jina xwe ya yekemîn, keçeke wî ya ciwan hebû. Ev keçik ji aliyê qencî û kubariyê ve bêhempa bû. Wê ev aliyê xwe ji diya xwe girtibû, diya wê jina herî qenc a dinyayê bû. Piştî demeke pir kurt ji ser dawetê, jinbav ehlaqa xwe ya xirab nîşan da; li hemberî qencî û kubariya keça mêrê xwe bi awayekî ecêb aciz dibû. Lê ji ber qencî û kubariya keçika ciwan, herdu keçên jinikê li ber çavê mirov zêdetir reş dibûn û mirov ji wan herduyan zêdetir nefret dikir. Jinbav karê herî giran ê malê bi keça mêrê xwe dida kirin; keçik mecbûr bû cil û firaq bişûştana, nava malê bidaya hev, odeya jinbavê û herdu keçên wê berhev bikira û bimaliya. Keçika qenc li kogeha malê, yanî li embarê, li ser merşikeke pîs radiza, lê herdu keçên jinbavê jî di odeya xwe ya taybet de diman. Odeya wan li gorî modeya herî nû hatibû raxistin; nivînên wan pir delal û xemilandî bûn û neynikên wan ên bejnê hebûn. Neynik wisa mezin bûn ku mirov dikaribû ji pî heta serî xwe tê de bidîta.

Keçika feqîr li hemberî ewqas tehdeyan qet dengê xwe dernedixist û bisebir her tişt li gorî dilê wan pêk dianî. Wê nediwêrî ji bavê xwe re jî tiştek bigota. Çimkî jinbav mêrê xwe bi temamî girtibû bin hukmê xwe û ji ber vê yekê jî ku keçikê tiştek ji bavê xwe re bigota, bavê wê wê pir aciz bibûya û bi ser de biqîriya.

Keçik her roj, piştî ku karê xwe diqedand, diçû li ber tifikê rûdinişt. Û ji ber xweliyên nav tifikê ser û çavê wê, cilên wê tev di nav xweliyê de diman. Îca ji ber vê yekê jî herdu keçên jinbavê bi tinazî navê "Xwelîxan" lê danîbûn. Tevî ku wan cilên pir delal li xwe dikirin, xwe gelek dixemilandin jî, lê Xwelîxan sed carî zêdetir ji wan herduyan xweşiktir bû.

Rojekê, kurê qral şahiyek li dar xist û bangî hemû keçên wî welatî kir. Herdu keçên jinbavê pir kêfxweş bûn ku ew ê biçûna şahiyê. Lê belê ji bo Xwelîxanê jî ev dihat tehde û westana zêdetir. Çimkî wê ê cilên xwişkên xwe bişûşta, utî bikira û hemû xizmeta wan bikira.

Herdu keçik jî wan rojan tenê behsa cilûbergên xwe dikir. Ya mezin digot:

--Ez ê fîstana xwe ya sor a qedîfe li xwe bikim û xişrên xwe yên herî taybet bi xwe ve deynim.

Ya biçûk digot:

--Ez ê fîstana xwe ya sade li xwe bikim, lê di ser de jî mantoya xwe ya ji tayê zêrîn neqişandî li xwe bikim...

Roja şahiyê, wan piştî ku cil û bergên xwe li xwe kirin, porê xwe jî çêkirin. Dawiyê ji Xwelîxanê jî pirsîn ka çawa çêbûye porê wan. Ji ber ku wan baş dizanibû ku Xwelîxan xwedî zewqeke taybet e. Xwelîxanê hem fikrê xwe ji wan re got, hem jî piştre hewl da ku porê wan hê xweşiktir çêke. Dema ku Xwelîxanê porê wan çêdikir, herduyan jê re got:

--Xwelîxan, tu ê jî kêfxweş bûbûyayî ne, bi çûyîna şahiyê?

Xwelîxanê got:

--Hûn henekê xwe bi min dikin! Na, mixabin tiştê ku min divê, ne ev e!

Îca wan got:

--Tu rast dibêjî. Bifikire bi çûyîna te herkes wê çiqas henekê xwe bike, ne!? ha ha ha!

Lê ji ber ku Xwelîxan keçeke pir qenc bû, porê wan gelek xweşik çêkir. Û piştî ku her tişt temam bû, herdu xwişk tevî diya xwe rabûn çûn şahiyê. Xwelîxan bi xemgînî li dû wan nihêrt. Dema ku ew êdî nexuyan, Xwelîxan dest bi giriyê kir. Dadika wê, dema dît ku keçik hêstiran dibarîne, jê pirsî ka ew çi dixwaze, ka ew çima digirî.

Ji ber ku Xwelîxan gelek digiriya, feqîrê nikaribû bipeyiviya. Dadika wê, ku ew periyeke sihirbaz bû, ji Xwelîxanê re got:

--Tu dixwazî herî şahiyê, ne wisa ?

Xwelîxanê kesereke kûr kişand û got:

--Erê, ez pir dixwazim herim şahiyê.

--Tu keçeke pir qenc î, got dadika wê, ez ê aniha te bişînim wê derê.

Îca dadika wê ew bir odeya xwe û jê re got:

--De zû here bexçeyê û ji min re kundirê mîranî bîne.

Keçikê çû kundirê herî delal neqand, anî da dadika xwe ya perî, lê wê qet texmîn nedikir ka ev kundir wê bi kêrî çi bihata. Periya sihirbaz darikê xwe yê sihrê li ser kundir gerand û ew kundir di cih de bû faytoneke pir xweşik.

Piştre periya sihirbaz çû li qefesa xwe ya mişkan nihêrt, di qefesê de şeş mişkên zindî hebûn. Wê ji Xwelîxan re got ka deriyê qefesê ber bi jor ve hinek bikişîne. Keçikê derî ber bi jor ve hinek bilind kir û her cara ku mişkek jê derket, periya sihirbaz darikê xwe yê sihrê bi nermahî li wî mişkî da û mişk bûn hespên delal. Dadikê du gumgumok jî girtin û darikê xwe yê sihrê li wan gumgumokan jî da, û gumgumok jî bûn ajovanên faytonê.

Dûre periya sihirbaz ji Xwelîxanê re got:

--Ji bo ku tu herî şahiyê, êdî her tişt temam e, haydê siwar be.

Xwelîxanê got:

--Ma ez ê çawa bi van kincên xwe yên kevn û qetiyayî biçim şahiyê ?

Periya sihirbaz darikê xwe yê sihrê li ser Xwelîxanê jî gerand û di wê kêliyê de cilên Xwelîxanê guherîn û bûn cilên pir delal ên bi zêr û zîvan neqişandî. Periyê piştre cotek şimikên ji camê jî da keçikê. Ev, şimikên herî delal ên dinyayê bûn. Piştî ku Xwelîxan ha wisa bi wan cil û bergan bû mîna prensesan, ew çû li faytonê siwar bû ji bo ku here şahiyê. Lê belê periyê ew sekinand, tembî lê kir û got:

--Keçika delal, divê berî nîvê şevê tu vegerî malê. Çimkî piştî nîvê şevê, fayton wê dîsa bibe kundir, hesp wê bibin mişk, ajovan jî wê bibin gumgumok. Kincên te jî wê bibin mîna berê, kevn û qetiyayî. Divê tu deqeyek tenê jî dereng nemînî.

Xwelîxanê soz da pîrê ku ew ê beriya nîvê şevê ji qesrê derkeve û vegere malê. Piştre keçik çû şahiyê. Dema ku ew gihîşt qesrê, xizmetkar çûn ji kurê qral re gotin ku prenseseke nenas hatiye û xuyaye ku ew ji malbateke mezin e. Prens bi bazdan çû cem prensesa nenas, destê wê girt, ji faytonê daxist û ew bir salona ku herkes lê bû. Bi carekê bêdengiyeke mezin çêbû; êdî muzîk sekinî û kes nereqisî. Herkesî bi baldarî li delaliya vê prensesa nenas dinihêrt. Herkes bû heyrana prensesa nenas, yanî Xwelîxana delal. Di wê kêliyê de, miremir hatin bihîstin:

--Aaa, çiqas delal e!

--Erêêê, pir delal e!

Qral bi xwe jî, ku ewqas ixtiyar bû, nikaribû dev ji temaşekirina keçikê berde û bi dengekî nizim ji qralîçeyê re got ku ji demeke dirêj ve ye wî keçeke ewqas delal û şîrîn nedîtiye. Hemû jinên di şahiyê de çavên xwe zîq kiribûn li cil û berg û porê keçikê dinihêrtin ji bo ku dora rojê ew jî xwe wisa bixemilînin û delal bikin. Kurê qral prensesa delal bir cihê şerefê, piştre jî pê re reqisî. Keçik wisa bi delalî û kubarî direqisî ku herkes zêdetir bû heyrana wê. Dûre xwarinên pir xweş hatin amadekirin, lê belê prens tu tişt nexist devê xwe û hertim li prensesa delal temaşe kir. Prensesa delal a nenas, yanî Xwelîxan, çû cem xwişkên xwe rûniştû pir bi nazikî û kubarî li hemberî wan tevgeriya. Prens sêv û pirteqal jêdikir û dida destê wê, wê jî ew hemû dida xwişkên xwe. Herdu xwişk pir şaş û metel mabûn, çimkî wan ev prensesa biyanî qet nas nedikir. Dema ku ew herdu di nav xwe de li ser prensesa nenas dipeyivîn, Xwelîxanê bihîst ku saet donzde kêm çarîk e, yanî ji nîvê şevê re tenê çarîkek maye. Îca keçikê silav da derdora xwe û bilezûbez ji qesrê derket çû malê. Dema ku ew gihîşt malê, çû cem dadika xwe ya sihirbaz û jê re gelek spas kir. Piştre jî got ku ew pir dixwaze sibe jî here şahiyê, çimkî kurê qral ev tişt jê rica kiriye. Tam dema ku wê behsa şahiyê ji dadika xwe re dikir ku bi carekê du keçên jinbavê hatin û li derî dan. Xwelîxanê çû derî ji wan re vekir û got:

--Hûn çiqas dereng man wisa !

Wê wisa got, çavên xwe firikandin û wekî ku nû ji xew şiyar bûbe bawîşk anîn. Lê di rastiyê de qet xewa wê nedihat. Yek ji xwişkên wê ji Xwelîxanê re got:

--Eger tu bihatayî şahiyê, tu ê hîç aciz nebûyayî. Prensesa herî delal a welêt jî hat wê derê. Yeke wisa delal e ku heta niha wek wê nehatiye dîtin. Ew li hemberî me pir nazik û kubar bû, wê bi destê xwe sêv û pirteqal dan me.

Xwelîxanê kêfa xwe qet nîşan neda: wê navê prensesê ji xwişkên xwe pirsî, lê belê wan got ku ne ew ne jî kesekî din navê prensesê dizane. Û gotin ku kurê qral ji ber vê yekê pir xemgîn bûye û gotiye ku kê derbarê wê prensesê de agahî bîne, ew ê her tiştê xwe bidiyê. Xwelîxan bişirî û ji wan re got:

--Bi rastî jî ew pir delal bû ha? Hûn çiqas bextewar in niha, ne ? Mixabin, ez ê tu caran wê prensesê nebînim.

Xwelîxanê ji xwişka xwe ya biçûk pirsî got:

--Tu dikarî wê fîstana xwe ya zer ku tu her roj li xwe dikî, ji bo demekê bidî min?

Xwişka wê got:

--Yaa erê, ez fîstana xwe bidim te ji bo mişkeke wek te bi fîstana min delal be, ne? Ma ez dîn bûme vê yekê bikim.

Xwelîxanê baş dizanibû ku xwişka wê wê jê re wisa bigota. Jixwe dema ku xwişka wê fîstana xwe bidayê, ew ê pir şaş bimaya û ji xwe şerm bikira ji ber pêşhukmê xwe. Dora rojê herdu xwişk, û tabî Xwelîxan, dîsa çûn şahiyê. Lê Xwelîxan ji roja yekemîn zêdetir xemilandî û delal bû. Kurê qral dîsa hemû wextê xwe pê re derbas kir. Prensesa nenas, yanî Xwelîxan, di şahiyê de gelek şa û bextewar bû, û tembiya periya sihirbaz ji bîr kir. Dema ku saeta mezin a dîwêr, di diwanzdehê şevê de dest bi lêdanê kir, Xwelîxan bi carekê rabû û bilezûbez ji salonê bazda çû. Prens ket dû wê, lê wî nekarî ew zeft bike. Keçikê wisa lez kiribû ku ferek şimika wê ya ji camê ji piyê wê derketibû û li wir mabû. Prens çû ew şimik bi delalî ji erdê rakir.

Dema ku Xwelîxan gihîşt malê, feqîrê bêhn lê çikiyabû. Êdî ne ew xeml û cilûberg, ne fayton, ne jî ajovan mabûn li holê. Tenê ferek şimika ji camê di piyê wê de bû, ku fera din jî li qesrê ji piyê wê derketibû.

Li aliyê din jî, li qesrê, ji prens ji nobedaran pirsî gelo wan nedîtiye ku prensesek ji derî derketiye. Lê wan got ku ji xeynî keçikeke ciwan a cilqetiyayî û gemarî tu kes ji wir derbas nebûye.

Dema ku du xwişkên Xwelîxanê ji şahiyê vegeriyan malê, Xwelîxanê dîsa ji wan pirsî ka ew dîsa ewqas kêfxweş bûne, û ew prensesa delal dîsa hatiye wir an na. Wan jî got :

--Erê, em pir kêfxweş bûn û prensesa nenas dîsa hat şahiyê, lê belê dema ku saet li nîvê şevê da, prenses ji qesrê reviya çû. Ew wisa bilezûbez çû ku ferek şimika wê ya ji camê ji piyê wê derket. Kurê qral ew fera şimikê anî û heta dawiya şahiyê jî lê temaşe kir. Xuyabû prens aşiqê prensesa nenas bûye.

Wan rastî digot, çimkî piştî çend rojên din, kurê qral xeber şand her derê welêt û hat gotin ku ew şimik li piyê kîjan keçikê were, prens wê pê re bizewice. Xebatkarek ji qesrê, mal bi mal geriya û wî ew şimik di piyê hemû keçikan de ceriband. Pêşî prenses, piştre duşes û bi dû wan keçên dewlemendan. Lê bêfeyde bû. Dawiyê ew xebatkar hat mala ku Xwelîxan lê dijiya... Herdu xwişkên Xwelîxanê gelek hewl da ku piyê xwe bixin nav şimikê, lê belê wan beredayî xwe westand. Ji ber ku piyê yekê dirêj, piyê ya din jî pir qelew bû. Xwelîxana ku li wan dinihêrt û şimika xwe nas kir, bişirî û got:

--Ez dibêjim ev şimik tam li gorî piyê min e.

Herdu xwişkên wê keniyan û henekê xwe pê kirin. Lê xebatkarê qesrê ku şimik di piyê keçikan de diceriband, zêdetir bi baldarî li Xwelîxanê nihêrt û ferq kir ku ew keçikeke pir delal e, û got ku wî ferman girtiye ji bo ku wê şimikê di piyê hemû keçikan de biceribîne. Piştre wî zilamî Xwelîxan rûniştand û şimik da wê. Xwelîxanê jî pir delalî û hêsanî ew şimik xist piyê xwe. Li hemberî vê yekê, herdu xwişkên wê şaşûmetel man. Îca dema ku Xwelîxan fera din jî ji bêrîka xwe derxist û ew jî xist piyê xwe, şaşbûna wan hê zêdetir bû. Tam di wê kêliyê de, dadika Xwelîxanê, yanî periya sihirbaz jî hat û darikê xwe yê sihrê li Xwelîxanê da û ew ji berê zêdetir û ji yên din hê delaltir bû.

Ha wê demê, herdu xwişkên wê fam kir ku Xwelîxan, ew prensesa nenas a şahiyê bû. Herduyan xwe avêt ber piyên wê û jê lêborîn xwestin, ji ber tehdeyên ku li keçikê kiribûn û ew pir êşandibûn. Xwelîxan ew rakirin, hembêz kirin û piştre ji wan re got ku ew li wan dibore û ji wan tika dike her tim jê hez bikin. Dûre xebatkarê qesrê Xwelîxana delal girt û bir qesrê. Prens bi dîtina wê gelek kêfxweş bû û piştî demeke pir kurt prens û Xwelîxan zewicîn. Xwelîxana ku bi qasî delal bû pir dilpak jî bû, herdu xwişkên xwe li qesra xwe bi cih kirin û di roja daweta xwe de ew bi du serbazên qesrê re zewicandin.

Çîroka me qediya,

Xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.